


# Temenê parêz ji bîr neke!

Kesê serî 16 sal nabe di gel kesê ku bin 16 sale pêwendiya sêksî hebe.*

* Nizîk bûna sêksi bo mînak dikare karê sêksî, maç kirin û lawandina cîhên hestyare cesteya mirov bin.

Parêza temenê 18 saliyê dibe hegera wê ku hemû kesên bin temen li kesên bi tementir wek mamosta, rahêner an jî kar bidestên din li bikar anîna sêksî bên parastin.

Amade kirin, weşandin ew weneyên ku sinûra sêksiye zarokên bin temenê 18 salî bin pê dike, wek tawan tê hejmartin.

Hewil dayîn û kirîna xizmetguzariya sêksî li kesên bin 18 salî wek tawan tê dîtin.

---

Bi dîyarî kirina temenê parêz, armanc ewe geşekirin û pêşveçûna derûnî, sêksî, civakî û cesteyiya zarok û ciwanan bê parastin.

Temenê parêz her wisa çalakiyên naw înternêtê jî li xwe digire.


Her wisa pêşniyar dan û hewil dan ji bo karê sêksi tawanin ku yasayê siza bo diyarî kirine.

Li yasaya tawanan de her wisa rê û şûnên sinûrdar hene ku bi gor wan pêwendiya sêksî demek tawan nayê hejmardin ku mafê çarnivîsa sêksiya kesê hember nehê bin pê kirin û her wisa navbera aliyan li warê temen, rewşa cesteyî û derûniya wana da cûdahiyek mezin nebe.

Afîş bi alîkariya polîs hatiye amade kirin.

VIGOR

Kurdi kurmandži



# Tawan an ne?

### Kesê 13 sal di gel kesek 20 sal pêwendiyên sêksî heye.

Tawanek giran!

### Mamostayê 28 salî digel dibistaniyek 17 salî karê sêksî kiriye.

Ew pêwendiyên han wek pêwendiyên yeksan nayên dîtin. Ciwan belkî razî be bi wê pêwendiyê ji bo ku dilê wî/wê xweş bike an jî bo wî/wê zehmet be hember daxwaza mamosta berxwe bide, diber ku mesele elaqe bi mamoste heye.

Tawanek giran!

### Kesê 25 salî wêneyan rûte xwe bo keçên 10 – 15 salî dişîne, ew li keçan daxwaza wêneyên rût dike û wana li rêya wêb-kamêra mêze dike.

Tawanek giran!

Tawan nîne!

### Kesê 15 û 16 salî hej hev û dû diken û rêz û huermeta hev radigirin û pêwendiya sêksî hene.

Ger kesek 15 û 16 sal bi hev pêwendiya hezlêkirinê hebin û rêz li hev bigrin û pêwendiyên wan yê sêksî hebin bêy zext û zorî û neçar kirinê, mercên tawanê pir nabin. Bi giştî li rewşekî wisa de pêwendî behre wergirtina xerap li hev nîne belkî pêwendî yeksan û wek heve di navbera dû kesan. Cudahiya temenê wana gelek nîne, û li warê geşeya cesteyî û derûniyewe ew ciwanane nizîkî hev bûn. Dê û bavên zarokê 15 salî belkî bi awayek din hizir bikenewe û sikala û şikayetê biket.

Tawan nîne!

### Zarokên 13 û 14 salî bi hev sêksê dikin. Ev zorê li hev nakin û hev û dû jî bi xerabî bikar naînin an hev û dû neçar nakin.

Tiştek nikare rêya pêwendiya sêksiya kesên bin 16 salî bigire, ger herdû alî wê yekê bixwazin û li pêwendiyê de zorî, zext û givaş, bikaranîn û neçar kirin nebe. Li hinek mijarande dezgeha birêwebirina zarokparêzan dikeve holê.

Tawan nîne!

### Kesê 14 salî bi kesek 20 salî hej hev dikin. Ewana pêwendiyên sêksî bi hev nînin.

Mirov dikare hej hev û dû biket ger yêk ji wana mezin û evê din bin 16 salî be. Li wê pêwendiyêde nabe karên sêksî wek maçkirin, lawandina cîhên hestyar an jî ji hev nizîk bûn.